

→ Dema ji dibistana serateyî derbasî ya navîn (pol / sinifa 5 an) bû, divê haja me ji çi hebe.

Fällt wg. Corona aus!

→ **Ev ji ber Corona betal bû!**

07.10.2020	Çalakî „Piştî dibistana serateyî divê mirov biçe ku derê?“
11/12- 2020 bis 01-2021	<p>Ji bo dibistanên navîn, roj û demên vekirî yên agahdariyê.</p> <p>→ ŞANE: Agahî dikare bi rêya înternetê jî bînin peyda kirin: www.bildung-in-bielefeld.de yan jî www.bielefeld.de (bi sernavê: Bildung / Schulen)</p>
25.01.2021 - 29.01.2021	<p>Li dibistanên serateyî dayina rapor / karnameyên nîv-salê (6 heyvî/mehî)</p> <p>Ji bo dibistanên bajêr destpêkirina kaxetên qeydkirinê</p> <p>Ji dibistana serate ya zarokên xwe hûn dê kaxeta qeydkirine bigirin. Ji kerema xwe vê kaxeta qeydiyê dagirin û bi xwe bibin dibistana navîn ya bajêr ya ku hûn dê zarokên xwe lê qeyd bikin.</p>
	→ Heger hûn bixwazin ku zarokên xwe li dibistaneke taybet (privat) qeyd bikin, hûn dikarin ji wê dibistana taybet agahdariyên ji bo qeydkirinê hîn bibin.
	<p>Ji bo hîlbijartina Dibistanên Navîn hinek şanek / agahî</p> <p>Babetên Dibistanên Navîn ev in: →</p> <div style="border: 1px solid red; padding: 5px; margin-left: 20px;"> <p>Hauptschule, Realschule, Sekundar- schule, Gesamtschule, Gymnasium = Weiterführende Schulen = SEK I-Schulen = Klassen 5-10</p> </div> <p>→ Şanek:</p> <ul style="list-style-type: none"> ✓ Dema we zarokên xwe li dibistana navîn bikin divê hûn guhên xwe bidin şîret / pêşniyara dibistana berê. ✓ Divê hûn haj ji pêşniyara dibistana serate ya ji bo derbasbûna dibistana navîn hebin! ✓ Gelo plana dibistanê ya perwerdeyê (pedagojîk) li gor pêwîstiyên zarokên we ye? ✓ Li gorî we, kîjan dibistan wê baştir piştgirîya zarokên we bike? ✓ Gelo rêya dibistanê ji bo çûn û hatina zarokên we ewle / baş e? ✓ Dibistana ku hûn dixwazin zarokên xwe bişîninê, tevahiya rojê yan jî danek / nîvroj e? (Li wir çavderî / lêniqatebûna piştî nîvroj heye yan na?) ✓ Ev / ew dibistan ya bajêr/şaredariyê (dewletê) yan jî ya taybet / şexsî e?
13.02.2021 - 12.03.2021	<p>Dema qeydiya dibistanên navîn yên bajêr (dewletê)</p> <p>→ Ji bo têkiliya di navbera we û rêveberên dibistanan hêsan bibe, hûn dikarin ji 17 ê Sibate û pêy ve xwe bigihînin wan û bi wan re peywendîyê çêbikin. Dema têkiliya bi rêveriya dibistanan di 19.02.2021 ê de dest pê dike.</p>
	→ Dema qeydkirina dibistanên taybet li gorî yên şaredariyê tê diyarkirin. Ji bo tarîxa rojên qeydkirinê yên taybet ji kerema xwe re bi dibistanên taybet re têkevin têkiliyê.

→ Dema ji dibistana serateyî derbasî ya navîn (pol / sinifa 5 an) bû, divê haja me ji çi hebe.

	<p>Qeydkirina Dibistana Navîn</p> <p>Qeydkirina dibistanên navîn li buroyên / sekreteriyatên wan dibistanan tê çêkirin.</p> <p>→ Ji bona qeydkirinê, divê em / mirov çi bi xwe re bibin?</p> <ul style="list-style-type: none"> ✓ Forma / kaxeta qeydkirinê ya dagitî yanî ya hatiye nivîsandin (→ Forma / kaxeta qeydiyê ji dibistana serate tê girtin) ✓ Tevî pêşniyara ji bo babetê dibistana navîn ku dibistana zarokên wê nivîsandiye û karneya wan ya nîvsala dawîn yanî karneya duyemîn (ya pol / sinifa 4 an) ✓ Belgeya / kaxeta bûyina zarokên we yê ku wê/dê qeyda wan bê çêkirin ✓ Heger ku hebe: Belgeya avjenîya / sobaniya zarokên xwe (Mînak wek belge, rozeta / nîşaneyê avjenîyê „Hespê avî/avê“) 	
<p>ab 15.03.2021</p>	<p>Biryara qebûlkirina zarokên we ya ji bo dibistana navîn, piştî qeyd xelas bibin, di dema herî nêzik de wê ji we bê ragihandin.</p> <p>Di derheqê vê mijarê de ango qebûliya qeydkirinê de, dibistana navîn ya ku we qeydiya zarokên xwe lê çêkiriye, wê bi nivîskî we agahdar bike.</p>	<p>→ Heger ew dibistana ku we zaroka/ê lê qeyd kiriye, qeyd nehatibe qebûlkirin (Wek mînak li wê derê, yanî dibistanê cih nemabe / tunebe) wê ji we re bersîva redkirinê û forma qeydkirinê ya eslî / orjînal bê şandin. Bi nameya/mektûba redê û forma/kaxeta qeydkirinê, hûn dikarin zarokên xwe li dibistaneke din ya navîn qeyd bikin</p> <p>Hûn dikarin di malpera înternetê ya bajarê Bielefeldê de (→ www.bielefeld.de) bibînin ku hêj / hîn li kîjan dibistanên belaş hene ku hûn bikaribin zarokên xwe li wir qeyd bikin.</p>
	<p>Mesrefa rêya dibistanê a xwendekaran / kerta xwendekaran / kerta rêya dibistanê</p> <p>Ji bo sala perwerdeya 2020/2021 xwendekarên şaredariyê bajarê Bielefeldê biryara Kerta xwendekaran hatiye dayin. Ev kerta rê, li gor bihayê Bielefeldê, mehane ji bo hemû navgînên / wesayîten giştî / komî derbasdar e û ji bona tevahiya salê her roj û her saetê dibe. Kerta xwendekaran li şûna kertên dibistanê yê berê ku navên wan Kerta rêya dibistanê tî / wê bê bikaranîn. Ji bo xwendekarên mafê / heqê wan yê girtina mesrefa / heqê rê hebin wê/dê bikaribin bi erzaniî bikirin. (wê ji bo para tevkarîyê ya mehane, bihayek ji aliyê xwendekaran ve bê dayin) Ji bo xwendekarên dibistana serateyî yê guncaw ku heqê wan yê Pasa Bielefeldê ya wan hene, wê/dê kertên rê, belaş / bê dirav (pere) bistînin. Ji bona xwendekarên ku heqê wan yê Pasa Bielefeldê tunebe / nîbe, xwendekarên nû wê xwe bi xwe kertên xwe yê rê bikirin. Heqê kerta rê ya xwendekaran, mehane 29 Euro ye. Ji bona wesandina kertên xwendekarên nû, divê forma / kaxeta wesandina ji bo kertê bê kêmasî bê dagirtin bi rêya dibistanê serlêdana xwesteka kertê bê kirin.</p> <p>→ Şanek: Ji agahiyên berfirehtir pirtûkoka / broşura „Heqê kerta rêya xwendekaran“ li dibistanan hene yan ji saziya Daireya Perwerdeyê ya bajarê Bielefeldê (Amt für Schule) ji bîr peyda kirin. Yan jî bi rêya înternetê www.bielefeld.de, (bi peyvên serenav wek: Bildung / Schule / Schülerfahrkosten) agahdariyên hewce dikare bîr peyda kirin.</p>	
<p>12.08.2021</p>	<p>Ji bo pola 5 an roja yekem ya destpêka dibistanê di 2021 ê de ye</p> <p>Ji dil pîroz be! Zaroka/ê we wê di demek nêzik de dest bi pêvajoyeke jiyane ya nû bike. Em ji we re bextewarî û serkevtine dixwazin!</p>	